Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :987 | 14-Tebax- 2022 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
423165

# Aramiya li nava xwezayê


**Kî naxwaze di nava xwezayê de, di nava kulîlkên rengîn de wextekî xweş derbas bike?**


Kî naxwaze di nav xwezayê de, di nav kulîlkên rengîn de wextekî xweş derbas bike. Bimeşe yan jî li bin darekê xwe dirêj bike û bêhna xwe vede. Wêneyên şêwekara Estonyayî Laivi Poder aramiyê bi ruhê mirovî re çêdikin û weke ku mirov li wê xwezayê be didin hîs kirin. Derbên firçeya wê pirr henûn û kubar in, tabloyên xwe jî bi rengên zindî çêdike. Wêneyên wê yên pastoral dewlendiya xwezaya rengo rengo jî nîşan didin.

Xaniyekî piçûk yê dûr, kesên ku bi tena serê xwe derketine gerê, şiverêyeke ku bi kulîlkan xemilandî ye, merivên ku li bin darekê xwarinê dixwin û heywanên li xwezayê... Laivi Poder bi van mijaran re elaqedar dibe.

Wêneyên wê belkî ji rêzê û hêsan bin, lê bandora wan ne wisa ye! Laivi Poder vê hezkirina xwe ya ji xwezayê ji gundê xwe digire, ji ber ku ew li gundekî piçûk yê di nav xwezayê de hatiye dinyayê. Di teswîrên wê de ev yek xuya ye ji xwe bê ka jiyana li gund çiqas lê tesîr kiriye û ev yek çawa bûye îlhama hunerê wê.

***Ozgûr Polîtîka***





## Quncika Têgînan

| | |
|---|---|
| **Insiyatîf** (Fransî) | **1. Selahiyeta dayîna biryaran. 2. Teybetiya kesê dizane biryarên girîng bide: Filankes bi insiyatîf e. Di nava xwe de insiyatîfek ava kirin. Insiyatîf xist destê xwe.** |
| **Kanalîzasyon** (Fransî) | Di binê erdê de kanalên ku ava vexwarinê, yan jî ava pîs di wan de derbas dibe. Coya binerdî, Karêz. |
| **Kongre** (Fransî) | Civîna herî bilind ya partî, yan saziyekê ku biryar tê de tên dayîn, yan jî serok tên hilbijartin. |
| **Komplo** (Fransî) | Plan û projeyên bidizî. Bêbextî, mûamere: Serokên Kurdan tev bi komployan hatin girtin û kuştin. |
| **Konsept** (Fransî) | Konsept. Plan û projeyên ku gelek xalan di nava xwe de dihewînin: Êrişa ser Eyn Îsa parçeyek ji konsepta dagîrkeran e. |
| **Panel** (Fransî) | Rûniştin û civîna ji her kesî re vekirî. Yên tevlî dibin tev dikarin nêrîna xwe bêjin: Di tv. de li ser mijara jinan panelek hebû. |
| **Pêngav** | Destpêkirina karekî girîng, pêşdeçûyîn, çûna bi ser dijberê xwe de. Hemle: Pêngava 15ê Tebaxê ji bo Kurdan pir girîng bû. |
| **Semîner** (Fransî) | Civîna bi rêveberiya kesekî yan çend kesan, ji bo dayîna zanyariyan derbarê mijarekê de û gotûbêjkirina li serê: Mûhadere. Li ser mijara Neteweya Demokratîk semînerek hat dayîn. |
| **Slogan** (Fransî) | 1. Gotina kurt û balkêş ku nêrînekê diyar dike û bi hêsanî tê dubarekirin. Durişm: Çalakkeran bi "slogana" Bimire dagîrkerî" dewletên dagîrker şermezar kirin. 2. Gotina ku armanc û amûrên nasnema, civak û rêxistinekê bi awayekî cewher dide nasîn: Slogana filan partiyê ya vê serdemê wiha ye: |
| **Statû** (Fransî) | 1. Rewşa kesekî, di nava sazî yan civakê de: A. di şaredariyê de dixebite lê statûya wî (karker e, karmend de, berpirs e) ne diyar e. 2. Li welatekî rewşa civakekê di destûrnameyê de: Di destûra Tirkiyê de statûya Kurdan nehatiye diyarkirin. |

# `Xaka bi xwînê hatî avdan ti carî nabe dîl`

Dilîn Ehmed-Qamişlo

**Necah Gulo diyar kir ku, çawa gelê Rojava bi keç û xurtên xwe çeteyên dewleta tirkî ya dagîrker û DAIŞ têk birin, wê careke din bi berxwedan û têkoşînê, êrişên tirkî yên ser mirovayiyê jî têk bibe. Herwiha banga gelê walatparêz kir ku nehêlin xayîn li ser xaka pîroz bijîn**

Ji bo têkbirina armanca dewleta tirkî ya dagîrker, Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) 31`ê Tîrmehê bi navê SOND dest bi oparasyona girtina sîxurên MÎT'ê kir. Ji destpêka oparasyonê heta niha 36 kesên bûyîn sedema şehîdxistina şervan û sivîlan hatine girtin.

Endama Saziya Malbatên Şehîda ya bajarê Qamişlo Necah Gulo li ser êrişên dewleta tirkî ya dagîrker û sîxurên MÎT'ê ji me re axivî û bang kir ku her kes erkê xwe yê walatparêziyê pêk bîne nehêle Sîxur li ser xaka bi xwîna şehidan hatî rizgarkirin bijîn.

## `Dewleta tirkî bi ser neket û wê bi ser nekeve`

Endama Saziya Malbatên Şehîda ya bajarê Qamişlo Necah Gulo li ser êrişên dewleta tirkî ya li dijî gelê herêmê got, dewleta tirkî ji destpêka şoreşa Rojava, bi tevayiya hêza xwe êriş dike. Ji aliyekî din ve jî êrişî çiyayên azadiyê dike û wiha domand: "Gelê Rojava ji destpêka êrişên dewleta tirkî ya dagîrker heta roja îro, bi xwîna keç û xurtên xwe bi xwîna dayîk û bavên xwe, li ber xwe dide. Bi vî ruhê fedekar şervanan hêza herî xurt ya ku cîhan tev xistibûn nava tirsê, çeteyên DAIŞ`ê têk birin. Dewleta tirkî ya dagîrker ji destpêka şoreşê heta roja îro êrişên xwe li ser herêma me nedane rawestandin. Herwiha êrişî çiyên azadiyê jî dike. Li hemberî êrişan gerîlayên me têkoşîneke bêhempa didin meşandin. Yanî li her dera ku dewleta tirkî êriş dike bi ser neketiye û wê bi ser nekeve jî. Jixwe ev berxwedan wisa dike ku har û dîn dibe."

## `Divê em bi ruhê welatparêziyê mirovê xayîn ji nava xwe derxin`

Li ser armanca dewleta tirkî ya dagîker ji êrişan Necah Gulo desnîşankir ku, armanc jê ew e ku, gel bitirsîne û wan ji cih û warê wan koçber bike. Necah teqez kir ku gelê ku bi xwîna zarokên xwe xaka xwe parastibe û destkeftiyên herî binirx bi dest xistîn, wê ti carî dev ji weletê xwe bernade û soza ku bi şehîdan re dane ji soza xwe nayên xwarê.

Necah wiha dirêjî da axaftina xwe: "Sedema van êrişan ne tenê dewleta tirkî ye, eger xelkê me yê ku wijdana xwe difroşe (sîxûr) bi pereyan, agahiyan nedin dijmin, wê wisa bi hêsanî êrişî me neke. Di dema dawî de bûyerên bi vî rengî gelek rû dan. Di encamê de me gelek rêhevalên xwe spartin axê. Lê ev yek wê nedome emê rûreşiya wan ji cîhanê tevê re diyar bikin. Divê em bi destê xwe tola şehîdên xwe rakin. Lewra mirovê wisa divê li ser xaka me ya pîroz nejî."

## `Bi wijdan erkê xwe pêk bînin`

Necah Gulo got, bila dewleta tirkî ya dagîrker baş bizane ku wê ticarî dev ji axa xwe bernedin. Eger me 15`e hezar şehîd dabin emê milyonek şehîd bidin, lê em cih û ware xwe ji dijmin re nahêlin û naçin.

Herwiha Necah Gulo hevjîna Ş.Nûredîn, dayîka Ş.Mezlûm bal kişand ser nerawestandina balafirên dewleta tirkî û got, em her tim vê pirsê ji xwe dikin, gelo hêzên navneteweyî rêxistinên ku bi navê parastina mirova bang dikin, nabînin nabihîzin. Banga me ji wan re erka xwe ya mirovî bi cih bînin, li dijî van sûcan helwesta xwe diyar bikin. Necah axaftina xwe wiha domnad: "Bêdengiya van hêz û dewletan, havkariya wan bi dewleta tirkî ya dagîrker re diyar dike. Eger ne wisa be çima bêdeng in, çima rakirina balafirên keşfê yên dewleta tirkî li asîmanên Rojava qedexe nakin? Ji aliyekî em bi çekên hêzêên navneteweyî tên parçekirin, ji aliyekî din ve jî qaşo ji bo parastinê li herêmên me bi cih dibin. Herwiha bêdengiya wan ya li dijî tecrîda giran ya li ser Rêbertiya me, vê durûtiye wan eşkere dike. Banga me ji bo wan ew e ku helwesta xwe diyar bikin."



## `Divê em vê carê dijminê xwe têk bibin`

Necah li ser berxwedana gelê şoreşger wiha got: "Di rewşeke wiha de ya herî girîng û pêwîst ew e ku em li ser piya bin şervanên xwe li qadên şer tenê nehêlin. Herwiha banga min ji gelê Kurd re li her çar parçeyên Kurdistanê û li seranserê cîhanê herwiha ji gelê azadîxwaz re ew e ku, dengê azadiyê bilind bikin, çalakiyên cuda li dar bixin. Divê em bi berxwedana xwe bi hêrsa şervanên xwe şehîdên xwe yên azadiyê, dijminê xwe têk bibin."

## `Yan hebûn yan tinebûn`

Endama Saziya Malbatên Şehîda ya bajarê Qamişlo Necah Gulo axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Dewleta tirkî ya dagîrker ji bo qirkirina gelê Kurd êriş dike. Êrişa 6`ê Tebaxê ya li ser taxa Sînaa ya bajarê Qamişlo ku di encamê de du zarokên bi navê Aheng û Ehmed şehîd bûn, gelo ew PKKyî bûn. Ji bo wê em careke din bang li dewletên têkildar dikin ku erkê xwe bi cih bînin. Herwiha em ji miletê xwe re jî dibêjin bi siyaseta dijmin neyên xapandin, bav, xwîşk û birayên xwe ji bo çend qurûşên dinyayê nefiroşin. Heta dawiyê li ber xwe bidin, lewra em di dema hebûn û tinebûnê de ne."

# TEV-DEM: Pêngava 15'ê Tebaxê destana avakirina jiyaneke azad e


TEV-DEM'ê salvegera 38'an ya Pêngava 15'ê Tebaxê pîroz kir û diyar kir ku 15'ê Tebaxê pêngaveke niştimanî, wêrekî û lehengî bû. Herwiha da xuyakirin ku ev pêngav, li dijî qirkirin û mirinê destana avakirina jiyana azad e. ***R-3***



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 987 | 14-Tebax- 2022 | www.ronahi.net/ku/

# DIJMINÊN GELAN NABIN DOSTÊN TI KESÎ

# BI KAR ANÎN NIHA JÎ DIFIROŞE



## Alên dewleta dagîrker şewitandin û lihevhatina bi Şamê re red kirin

Li seranserê herêmên Sûriyê yên di binê dagîrkeriya dewleta Tirkan ya faşîst de, xwepêşandan li dijî siyaseta tirkî ya qirêj pêk hatin. Xwepêşandêran alên dewleta Tirkan şewitandin û lihevhatina bi hikumeta Şamê re red kirin. ***R-3***



# Ehmed Gulo: Emê tola şehîdan hilînin û armanca wan pêk bînin




Ehmed Gulo da zanîn ku êriş û balafirên dagîrkeriya Tirkan ti caran nikarin vîn û berxwedana wan bişkînin. Herwha got, pêwîstiya azadiyê bi çi hebe emê pêk bînin û bigihîjin armanca şêhîdên xwe. ***R-5***

# 'Di jiyanê de azadî, di şer de serkeftin'

- **Sedema pirbûna êrişên ser Rojava binketina li Herêmên Medya ye**
- **QSD'ê tol hilda û rûmeta gelê herêmê parast**
- **Tirkiye ji bo bazara li ser Kurdan çeteyên xwe difiroşe rejima Sûrî**

Krîza Sûriyê her ku diçe kûrtir dibe. Astana û Soçî sedemên sereke yên kûrbûna vê kirîzê ne. Dewletên wekî Rûsya , Îran û Tirkiyê ji bo berjewendiyên xwe li ser Sûriyê bazarê dikin. Li gorî daxuyaniyên Tirkiyê yên derbarê lihevhatina bi hikumeta Şamê re, tê xuyakirin ku di navbera Rûsya, Tirkiyê û rêjima Esed de peymanên nû pêk hatine.

- **Gelê herêmê ji bo şerekî dijwar û demdirêj amade ye.** ***R-4 Roportaja Mihemed Emîn Elîko***

## Di siyaseta bêpîvan de xeta sor nîne

Memed Serdar

Siyaseta dewleta tirkî ya dagîrker ya bi destê `dijberên rejima Sûrî` di parçekirina Sûrî de bi ser neket. Herî dawî ev hewldan bi civînên Cênêv û Astana xetimî. ***R-6***

## 'Tecrîda li ser Rêberê me, li dijî pîvan û rêgezên mafên mirovan e`

Têkildarî tecrîda li ser Rêber Abdullah Ocalan jinên bajarê Kobanê diyar kirin ku di nava tecrîdê de, tecrîdeke girantir heye û wiha gotin: `Tecrîda li ser Rêberê me, rêberê gelê aştîxwaz li dijî pîvan û rêgezên mafên mirovan e.` ***R-2***

## Gerîlayên Kurdistanê

Faruk Sakik ***R-4***

## Lembeya kesk ji bo tinekirina Kurdan her pêketî ye

Idrîs Henan ***R-5***

## Di Islamê de mafê xweparastinê

Hafiz Ahmet Turhalli ***R-6***

# ‘Tecrîda li ser Rêberê me, li dijî pîvan û rêgezên mafên mirovan e`

Têkildarî tecrîda li ser Rêber Abdullah Ocalan jinên bajarê Kobanê diyar kirin ku di nava tecrîdê de, tecrîdeke girantir heye û wiha gotin: `Tecrîda li ser Rêberê me, rêberê gelê aştîxwaz li dijî pîvan û rêgezên mafên mirovan e.`

Rêber Abdullah Ocalan li Girtîgeha Îmraliyê di bin şert û mercên giran yên tecrîdê de tê girtin. Parêzer û malbata wî hertim ji bo hevdîtinê serî li Serdozgariya Komarê ya Bursayê û Midûriyeta Girtîgeha Îmraliyê didin, lê belê ev serlêdan her tim bê bersiv dimînin. Têkildarî mijarê jinên li Kobanê ev nirxandin kirin.

**‘Girtina Serokê me nayê wateya, dikare ramanên wî ji nav me derxîne’**

Ji Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) ya Herêma Firatê, Zozan Emîn Mislim, di destpêka axaftina xwe de behsa tecrîda li ser Rêber Abdullah Ocalan kir û wiha lê zêde kir: “Ev 24 sal in tecrîda giran li ser Rêberê Gelan Abdullah Ocalan tê meşandin. Dewleta tirk Serok Apo, ji her tiştî dûr xistiye. Nahêle kes derbasî cem wî bibe û li rewşa wî pirs bike. Her wiha parêzerên wî dîsa jê qut kirine, ji her tiştî pêpar hiştiye. Dewleta tirk dijmin e, yanî deqeyekê vala namîne. Bila baş bizanibe ku girtina Serokê me nayê wateya ku dikare fikir û ramanên wî ji nav me derxîne.”

**‘Dewleta tirkî nikare welatê me, dagîr bike’**

Zozanê di dawiya axaftina xwe de bang li Rêxistinên Mafên Mirovan û Aliyên Berpirsiyar kir ku êdî rê li ber van kiryarên dewleta tirk bigirin û wiha dawî lê anî: “Gelê Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê li ser fikir û ramanên Rêber Apo dijî. Wê dewleta tirk jî her tim di nava xewn û xeyalên xwe de bimîne. Ji ber nikare welatê ku bi xwîna 11 hezar şehîdan hatiye avdan, dagir bike. Dewleta tirk wê nikaribe armanca nûjenkirina împaratoriya Osmaniyan pêk bîne.”

**‘Di nava tecrîdê de, tecrîdeke jê girantir çêdibe’**

Ji Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM), Nisrîn Îbo bi lêv kir ku di nava tecrîdê de, tecrîdeke jê girantir çêdibe û wiha pê de çû:” Tecrîda li ser Rêber Apo, bi rastî







ne tecrîdeke hindik e, ev tecrîd gelekî giran e. Ji ber di nava tecrîdê de, tecrîdeke jê girantir çêdibe. Her wiha rewşa wî ya tendirustiyê nayê zanîn ka bi çi rengî diçe. Dewleta tirk tecrîda xwe li ser Rêberê me ferz kiriye. Di heman demê de jî êrîşên xwe, li ser Rojavayê Kurdistanê bi rê û rêbazên cuda, dide meşandin.”

**‘Em ê azadiya Rêberê xwe mîsoger bikin’**

Nisrînê di dawiya axaftina xwe de teqez kir ku ew weke jinên kurd dê bi berxwedan û têkoşîna xwe de van gef û kiryaran têk bibin û azadiya Rêberê PKK’ê Abdullah Ocalan mîsoger bikin û wiha got: “Em tu carî ranawestin, çi kar ji me bê xwestin em  ê bi wî karî rabin. Em qebûl nakin ên dagirker welatê me dagir bikin û serokê me ji mafên wî bêpar bihêlin.”

**‘Li şûna gelê herêmê, hêza xwe ya dagîrker bi cih dike’**

Xwendekara Zanîngeha Kobanê Mihabat Ebdî jî wiha got:”Rewşa niha rewşeke pir zehmet û cidî ye. Her kes dibîne rewşa Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê di nava gef û topên dewleta tirk de maye. Ev ne cara yekê û ne ya dawiyê ye jî. Dewleta tirk her tim bi van şêweyên êrîşan dixwaze gel ji herêmê derxîne û hêza xwe ya dagirker li şûna gelê resen bi cîh bike. Hema ev êrîş û hewldanên qirkirinê li ber çavên tevahî cîhanê tê kirin. Lê tu dewletên garantor di vê mijarê de, li van deveran xwe berpirsiyar nabînin.”

**‘Tecrîda li ser Rêberê me, li dijî pîvan û rêgezên mafên mirovan e’**

Mihabat di dawiya axaftina xwe de daxuyand ku her tişt li ber çavên dewletên ku xwe berpirsiyar dibînin, dibe û wiha dawî lê anî: “Hemû cîhan gef û kiryarên dewleta tirk a li ser Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê tê kirin, dibîne. Her wiha ev tecrîda li ser Rêberê gelê aştîxwaz tê meşandin li dijî pîvan û rêgezên mafên mirovan e.
***JINNEWS***

# Rizgarkirina Minbicê ji bo jinan bû werçerx

**Sanaa Receb ya ji ber êrîşên çeteyên DAIŞ’ê neçar ma ji Minbicê derkeve û dema hat rizgarkirin vegeriya, niha di Koma Jinan ya Zenûbya de ji bo nûnertiya gelê Çerkes dixebite.**

Dema ku DAIŞ’ê Bakur û Rojhilatê Sûriyê dagir kir, jinan rastî gelek hovîtiyan hatin. Ji ber hovîtiya ku hatiye jiyîn, gelek kesên ku xwestin xwe, malbat û nasnameya xwe biparêzin, neçar man vê derê biterikînin û koçî cihên din bikin. Meclîsa Leşkerî ya Minbicê di 1’ê Hezîrana 2016’an de ji bo rizgarkirina Minbicê dest bi pêngava rizgarkirina Minbicê kir. Piştî berxwedana 73 rojan Minbic hate rizgarkirin. Piştî vê tevgerê gelek kesên ji Minbicê koçber bûne vegeriyan malên xwe. Rizgarkirina Minbicê ji bo gelek jinan bû xala werçerxê.

**“Li pêş çavên me sê xort serjêkirin”**

Sena Receb a 36 salî diyar kir ku DAİŞ’ê bi rihên dirêj û kincên reş ket bajêr û wiha pê de çû: “DAİŞ’ê di mizgeftan de gazî dikirin ku ew ehlê heqîqetê ne, lê piştî demekê rastiya wan a hovane hat keşfkirin. Xelkên bajar îcbar dikirn ku yasayên wan cîbicîbînin û destwerdan di kar û barên jinan de dikirin. Min qet nedixwest ku ji Minbicê derbikevin ji ber ku bajarê min e, lê em neçar bûn. Rojekê DAİŞ’ê gazî me hemûyan kir û ji me xwestin ku em biçin qadekê ji qadên Minbic, dema em çûn li pêş çavên me sê xort serjêkirin. Carekê jî ez ji aliyê çeteyên DAİŞ’ê ve rastî lêdanê hatim bi hinceta ku cilên min ne li gorî şerîetê ne.”

**“Hewl dan min bi çeteyekî DAIŞ’ê re bizewicînin”**

Sena Receb anî ziman ku derketina jinan ji malê bêyî mehrem yek ji sedemên girtina jinan bû û wiha axivî: “Ez bi rêya nexweşiya kurê xwe ji Minbicê derketim, lê bi min re mehrem tune bû ji ber vê yekê ez çûm navenda Hisba ji bo wergirtina destûra derketina ji derveyî bajar li gorî qanûnên DAİŞ’ê. Ji min xwestin ku ez emîrê DAİŞ’ê bibînim. Emîrê DAİŞ’ê pêşniyar kir ku ew ê ji min re mehremekî peyda bike da ku kurê xwe îlac bikim lê bi şertê zewaca min bi yek ji çeteyên DAİŞ’ê re. Rêbazê wan ên danûstendinê tirsank bû.”

**“Nasname û zimanê me li ser me bûbû bar”**

Sena Receb eşkere kir ku wê nasnameya xwe ya Çerkes înkar kir û wiha got: “Gelek ji wan digotin Çerkes ne misilman in û ji olê dûrketine



û qirkirina wan rewa ye, ji ber vê yekê min di gelek rewşan de digot ez ereb im, me nasnameya xwe vedişart. Nasname û zimanê me li ser me bibû bar. Ev rewşa hemû şêniyên Minbicê bû, çi Çerkes, çi Kurd û çi Tirkmen be.”

**“DAIŞ dijminê jinan e”**

Sena Receb anî ziman ku piştî çar rojan ji rizgarkirina bajarê Minbicê ew vegeriya bajar û wiha axaftina xwe berdewam kir: “Di destpêka rizgarkirinê de tirsa paşmahiyên DAİŞ’ê hebû, lê hewldanên Meclîsa Leşkerî ya Minbicê û Hêzên Sûriyaya Demokratîk ji bo rakirina paşmahiên wan mezin bûn û vê yekê ewlekarî da min ku ez li kolanên bajarê xwe bigerim. Dema ez vegeriyam mala min wêran bibû. Beriya ku DAİŞ’ê êrîşî me bike min wêneyên jinan xêz dikir, piştî rizgarkirinê dema ez vegeriyam malê min dît DAİŞ’ê hemû rismên min ên jinan qetandine û gotinên nexweş li ser wan nivisandibûn. DAİŞ’ê dijminê her tiştî ye, bi taybet dijminê jinan e.”

**“Daxwaza azadiya jinan dikim”**

Sena Receb bilêv kir ku pişî rizgarkirina bajarê Minbicê ew bû endama Kombûna Jinên Zenûbiya û wiha axivî: “Salvegera rizgarkirina bajarê Minbicê ji bo me bûyereke mezin e, ji ber ku em ji rezîltiyê rizgar bûn û em hêvîdar in ku bajarê Minbicê di warê ewlehî û aramiyê de wek xwe bimine.”
***JINHA/ Minbic***



# ‘Li dijî şer, zordarî û dagîrkeriya li Kurdistanê bi nivîsa xwe dibim bersiv’

Hevseroka Pena Kurdî Anîsa Caferîmehr têkildarî heskirina xwe ya ziman û wêjeya kurdî dibêje: “Ji bo vê heskirinê ez 2 caran ji aliyê rejima Îranê ve hatim girtin. Ji ber gef û zordariya li ser me em koçberî Almanya bûn. Çi dibe bila bibe divê em zimanê xwe bijînin û pêş ve bibin. Li vir jî di PENa Kurdî de em xwe pêş dixin û hev pêş dixin.”



Navenda PENa Kurd kongreya xwe ya 11’emîn roja 9’ê Tîrmeha 2022’yan li bajarê Oldenburgê yê Elmanyayê bi beşdariya zêditirî 70 endaman pêk anî. Kongre bi dirûşma “Zimanê Me Hebûna Me Ye” pêk hat û Anîsa Cehferîmehr û Omer Fîdan weke hevserokên PENa Kurd hatin hilbijartin. Anîsaya di biçûkatiya xwe de dest bi wêjekariya kurdî dike, di wê oxirê de berdêlê dide. Anîsa qala rêwitiya xwe ya wêjekariyê ya heta hevserokatiya PENa Kurd dike.

**Ji ber nivîskariyê tê girtin**

Anîsayê ji bajarê Kirmanşanê yê Rojhilatê Kurdistanê ye. Bi devoka Kelhurî diaxive. Zanîngeha wêje û zimanê Îngilîzî qedand û mastira xwe jî li bajarê Sîne di zangîngeha zimanzaniyê de qedand. Di pêvajoya xwendina zangîhehê de û piştî wê ji bo ziman û wêjeya kurdî xebatên berfirehtir dide meşandin. Di kovaran de helbest û nivîsên wekî din, dinivîse. Di kelhurî û devokên din ên zimanê kurdî de xwe pêş dixe. Lewra ji ber nivîsên wê yên kurdî ji aliyê rejîma Îranê ve 2 caran tê girtin. Piştî zext û gefên rejîma Îranê Anîsa bi piştgiriya PENa Elmanyayê koçberî Elmanyayê dibe.

**‘Kurdbûn sûcê siyasî tê qebûlkirin’**

Anîsayê li ser zextên rejîmê axivî û wiha pê de çû: “Li gorî wan ji bo girtin û zextê tenê pêwîst nake tu siyasetmendarek muhalîfê rejîmê bî. Ji wê zêdetir nasnameya te ya Kurdbûnê ji têr dike. Ango tu bi zimanê xwe biaxivî û bi zimanê xwe xebatê bidî meşandin hîn zêdetir dikevî berçav. Kurdbûn jî karekî siyasî tê hesibandin. Rejîma yekperest jixwe ji derveyî ziman û nasnameya xwe, zimanekî din û kesekî din qebûl nake. Li dibistanan tu kes nikare bi zimanê Kurdî biaxive û perwerdeyê bibîne. Dema li ser kovarê min girtin ji min re bi eşkere gotin nabe tu li ser ziman û wêjeya kurdî bixebitî. Di girtîgehên Îranê de îşkence pir e lê belê li ser min jî, ji îşkenceya fîzîkî zêdetir zextek derûnî hate meşandin. Ji bo astengkirina xebata me çi ji destê wan tê, dikin. Lê li dijî şer, zext û dagirkeriya li Kurdistanê bi nivîskariyê dibim bersiv.”

**‘Di girtîgehê de jî min berdewam kir’**

Anîsayê dibêje ew dizanî dema ji bo zimanê kurdî xebatê bike wê were girtin an jî zext li ser werin pêkanîn. Anîsayê wiha berdewam kir: “Min rûxmê wan zextan dest bi xebatê kir. Tiştê bandor li min dikirin jî qedexe bûn. Zimanê me kurdî bû lê li dibistanan qedexe bû. Eleqeya min ji zarokatiyê ve li ser wêjeya kurdî hebû lê belê digotin, hûn nikarin bi zimanê xwe berheman derbixin. Ev yek min bêhtir hêrs dikir. Li dijî qedexeyan, em hewl didin bi xebatên xwe bibin bertek. Di girtîgehê de jî min nivîsên xwe yên wêje û helbestan da berdewamkirin.”

**‘Ez dixwazim bi devoka Kelhorî perwerdeyê bidim’**

Anîsayê ya bi hevjînê xwe re xebatên ziman li Elmanyayê didin berdewamkirin wiha lê zêde kir:”Ez bi hevjînê xwe re li ser kovar û antolojiyê dixebitim. Berhemê me yê dawî ji berhevkirina berhemên 54 nivîskaran pêk tê. Ev antolojiya çîrokan bi 6 zaravayên zimanê Kurdî hatiye çapkirin. Niha jî li ser roman û çîrokan em dixebitin. Ez hewl didim di zaraveyê kelhûrî de xwe pêş bixim û perwerdeyê bidim. Li her çar parçeyên Kurdistanê êrişên bişaftina zimanê kurdî di pêş de ye. Ji ber wê jî erka me ye ku em zaraveyên xwe, zimanê xwe biparêzin. Divê ji bo pêşvebirinê çi ji destê me tê em bikin.”

**‘Di PENa Kurd de cihê jinê diyar e’**


Anîsayê herî dawî qala PENa Kurd dike û wiha dibêje: “Nêzî 150 welatên cîhanê xwedî pen in ku PENa Kurd jî yek ji wan e. Ez jî niha endama PENa Kurd û PENa Elmanyayê me. Armanca penê xebatên li ser ziman û pêşvebirina zimanan e. Li dijî gef û zextên li ser ziman û zimanzanan dibe asteng. Kongreya me ya dawî jî bi beşdarbûna gelek nivîskarên ji her deverê hatine re pêk hat. Li gel ku serketî derbas bû me encamên baş jî girt. Pêwîst e eleqeya ji bo PENa Kurd hîn zêdetir bibe. Nivîskar divê beşdar bibin, PENa Kurd bi hêz bikin û xebatên xwe jî pêşve bibin. Ya herî girîng jî li dijî şerê li Kurdistanê tê jiyîn em jî bibin deng. Divê em bi nivîsên xwe jî cîhanê agahdar bikin.”

Anîsayê herî dawî jî wiha got:” Di serî de em bi sîstema hevserokatiyê xwe bi rê ve dibin. Ev tena serê xwe jî cihê jinê diyar dike. Di asta rêveberiyê de zêdetirînê xwe jin cih digirin. Pêwîst e jin jî bêhtir bi eleqe bin û xwe beşdar bikin.”
***JINNEWS***

# Heval Kwêstan: Di nava PKK’ê de û li rojavayê Kurdistanê jin xwediya rolek mezin e

**Çapa Sisiyan ya pirtûka ‘Afret û janî li dayîbûnek nû’ ku ji aliyê Heval Kwêstan ve hatiye nivîsandin, piştî 44 salan hat belavkirin.**

Di dema xwe de ev pirtûk ji bo teşwîqkirina jinan û zanîna erk û mafên wan hatibû nivîsandin. Lê wekî ku nivîskar dibêje, “Şoreş û saziyên hikûmetê piştî şoreşê giringî nedan cih û fikrên jinan. Nekarîn sud ji kêrhatinên jinan wergirin ku niha li Rojavayê Kurdistan û di nava PKK’ê de jin xwedî rolek sereke ne.”
Derbarê çapa sêyem a pirtûka ‘Afret û janî li dayîbûnek nû’ nivîskar Heval Kuwêstan ji Rojnews re axivî.
Nivîskar Heval Kuwêstan da zanîn wî di  sala 1978’an de vê pirtûkê nivîsandiye, di sala 1979’an de hatiye çapkirin û heman salê li bajarê Mihabad ê Rojhilatê Kurdistanê dubare hatiye çapkirin. Heval got, îsal jî li ser xwesteka gelek dost û hevalan me cara sêyem çapkir.
Derbarê armanca nivîsandina pirtûkê de Heval Kuwêstan got: “Armanca sereke ya nivîsîna vê pirtûkê ew bû ku jin ji wê rewşa ku têde ne werin hişyarkirin, her wiha ji bo jin erk û mafên xwe yên civakî bizanibin ku çawan mafên zilam di yasa, civak û çandê de tên li berçavgirtin, bi heman awayî divê mafên jinan jî werin liberçavgirtin.”



Heval Kuwêstan da zanîn ji beriya 44 salan dema ku wî ev pirtûk nivîsand zext û zilmek mezin ya rejima Baas a wê demê hebû. Kuwêstan wiha domand: “Wê demê xebata nîştimanîjî pêwîstî bi beşdarîkirin û çalakiya hemû çîn û beşên civakê hebû. Armanca nivîsîna vê pirtûkê ew bû ku jin teşwîqî xebatkirinê bibin. Ji berku tevlîbûna wan hem xebata nîştimanî bihêz dikir hem jî cihê jinê di wê demê de  bihêztir dikir. Diviyabû piştî serkeftina şoreşê cih, rola jinê û kêrhatinên wê li berçav bihatana girtin. Jinan bikarîbûna di nava saziyan de cihek diyar girtiban û mil bi milê zilam xebat bikirana.”
Di dewamê de Nivîskar Kuwêstan got ku dema wê ew pirtûk nivîsandî bi hêvî bû ku şoreş di warê fîzîkî, hizrî û kêrhatinê de sud ji jinê wergire û wiha domkir: “Ez bi hêvîbûm ku jin wê di şoreşê de rola xwe hebin mîna niha ku jin di nava PKK’ê û şoreşa Rojavayê Kurdistanê de xwedî rolek berbiçavin. Lê mixabin saziyên şoreş û hikûmetê piştî şoreşa Başûrê Kurdistanê nekarîn sud ji jêhatinên jinan wergire û jin ji mafên xwe hatin bê parhiştin. Cardin hêvîdarim çapa vê carê ya pirtûkê bibe sedema beşdarîkirinek cidî ya di rastkirina vê rewşa giran ku jin têde ne. Bi taybet niha ku şideta li beramberî jinan gelek zêde bûye.”
Pirtûka ‘Afret û janî li dayîbûnek nû’ li tu pirtûkxaneyan nayê firotin. Ji berku ji aliyê nivîskar ve wek diyarî tê dayîna xwêneran. Piştî çapa sêyem jî li heşt bajar û navçeyên Herêma Kurdistanê daxwaz ji nivîskarê pirtûkê hatiye kirin bi merasîman pirtûka xwe bide nasandin.
***ROJNEWS***

# Di siyaseta bêpîvan de xeta sor nîne

Siyaseta dewleta tirkî ya dagîrker ya bi destê `dijberên rejima Sûrî` di parçekirina Sûrî bi ser neket. Herî dawî ev hewldan bi civînên Cênêv û Astana xetimî.

**Memed Serdar**

Hêzên desthilatdar ji bo gihîştina armancên xwe ti pîvan û rêgezên exlaqi nas nakin. Du hêzên dijber yên desthilatdar ji bo berjewendiyên xwe, 24 seetan dikarin bibin dost. Yan jî du aliyên dostên dîrokî ji bo berjewendiyên qirêj dikarin bibin dijminên sedên salan.

Bi taybetî dema mijar dibe Kurd hêzên herêmî û navnetevi tev nakokiyên xwe yên dîrokî datînin aliyekî û ji bo Kurd destkeftiyeke piçûk jî bi dest nexin, derfetên xwe tevan seferber dikin. Li gorî pêwîstiyên xwe tev hewl didin Kurdan ji bo xwe bi kar bînin. Yên ji bo bazareke piçûkk, bi hesanî û bi erzanî tên firotin Kurd in.

Di dîroka nêzîk de, têkiliyên Sûriye û Tirkiyê gihîştibûn asteke wisa ku civîna hevbeş ya weziran dihat lidarxistin. Li hemberî Kurdan lihevkirineke bêsînor hebû. Ev lihevkirin herwiha bi peymana Adana hatibû fermîkirin. Ev rewş heta şoreşa 19'ê Tirmehê hat domandin.

Pişt re bi navê "Bihara Ereban" destwerdana hêzên navneteweyî ya li Rojhilata Navî, bi taybetî li Sûrî, bi berjewendî û plansaziyên mezintir, ew lihevkirina Adana bêwate kir. Ew dostayiya li ser bingehê dijîtiya Kurdan hatî avakirin bû dijberî, gef xwarin û rasterast dijminyiya hev. Aliyê tirkî bi piştgirî û desteka NATO di daxuyaniyên xwe de digot, piştî 3 rojan emê nimêja Înê li Mizgefta Emewî bikin. Lê digel ewqas alîkarî û desteka bêsînor ya NATO, ji ber ku hêza pêkanînê ya tirki di meydanê de çete, talanker, dijminê namûsê bermayiyên DAIŞ'ê bûn, nikarî bigihe armanca xwe.

Di wê navê de aliyê tevgera azadiyê ya Kurdî weke ku aliyên siyasî difikirîn, tevlî aliyekî aloziyan nebû. Xwe bihêz kir û şoreşa xwe ava kir. Roj bi roj di her alî de xwe birêxistin kir. Sîstema xwe ya civakî û parastinê xurt kir. Xwe wek terefê 3'yan birêxistin kir û heta asteke bilind têkoşîna xwe ya ji bo azadiya gelan bi cîhanê tevê da nasîn.

Siyaseta dewleta tirkî ya dagîrker ya bi destê `dijberên rejima Sûrî` di parçekirina Sûrî bi ser neket. Herî dawî ev hewldan bi civînên Cênêv û Astana xetimî. Dema li ser parçekirina Surî kar dihat kirin, hesab li ser aliyê Kurdî nedihat kirin. Di civînên Cênêv û Astana de Kurd tine hatin hesabkirin. Lê asta pêşketinên leşkerî, dîplomasî û civakî, di serî de dewleta tirkî ya dagîrker, hêzên din yên li Sûrî xwedîhesab, tev tirsandin.
Rewşa dawî ya `mûareda Sûrî û asta pêşketina Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûrî di civîna NATO ya Hezîranê de hat nirxandin û weke her car erkê destwerdan û astengkirina herêmên Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûrî, dan dewleta tirkî ya dagîrker. Dewleta dagîrker jixwe vî erkî bi dilxwazî dike. Lê dema erkdarkirin fermî be, tê wateya vekirina tevayiya deriyan.




Herwiha nakokiyên xwe yên hundir û şerê xwe yê li hemberî tevgera azadiya Kurdî jî, bi destek û alîkariya NATO heta roja îro da meşandin. Lê encama şer ya rojane diyar dike ku digel bikaranîna çekên qedexekirî li wir jî xetimiye.

Eger baş bê şopandin, piştî civîna NATO civîna Tehran û Soçi li ser daxwaziya dewleta tirkî dan pêş. Daxwaziyên dewleta tirkî ya dagîrker her çiqas tev pêk nehatibin jî, di her civînê de tawîzeke piçûk girtiye.

Niha gelek aliyên siyasî pirsa encama civîna dawî ya Soçî û piştş civînê pirbûna êrişên dewleta tirkî ya dagîrker dikin. Geşadanên piştî civîna Soçî diyar dikin ku li Soçî dewleta tirkî, ji bo çareserkirina xetimîna xwe, ji hin xetên xwe yên sor gav paş ve avêtiye. Wisa xuya dike ku siyaseta xwe ya li dijî Sûrî guhertiye. Ew dewleta ku dewleta Sûrî bi fermî nas nedikir û bi nimêjkirina li Mizgefta Emewî gef dixwarin, niha bang li Sûrî dike ku careke din li hemberî Kurdan li hev bikin. Li gorî çavkaniyên rûsî jî mohrkirina peymana Adana ya 2'yan tê gotûbêjkirin.

Ji bo ku Kurd nebin xwedîstatû dewleta tirkî ya dagîrker derfetên xwe tev seferber kirine. Li ser vê mijarê berî çend rojan wezîra malbatê û xizmeta civakî ya dewleta tirkî Derya Yanik got, "em bi tevayiya hêza xwe ya dîplomatîk û leşkerî hewl didin ku Kurd nebin xwedîstatû". Ji bo pêkanîna vê armancê di her qadê de êrişî Kurdan dikin.

Her civîna bi hêzên navneteweyî re daxwaziya sereke ya dewleta tirkî, destûra êrişa ser herêmên Rêveberiyê Xweser e. Eger ev daxwazî pêk neyê jî qet nabe ji bo êrişên bi balafiran yên ser sînor çavên xwe bigirin. Wisa xuya dike ku di her civînê de yek ji van daxwaziyên wê pê tê.

## Di Islamê de mafê xweparastinê



Hafiz Ahmet Turhalli

Islam, ji bo ku ji mirovan re aramî, huzura dinya û axretê bide nasandin, jiyanê xweştir û biwatetir bike, bi pêşengiya Pêxember SXL hatiye teblîxkirin û di serdema Pêxember de hatiye cîbicîkirin. Ji îtîqadê bigire heta her hêla jiyanê ya bingehî, Islam xwedangotin û xwedanpîvanan e. Pîvanên ola Islamê, Qur'ana pîroz, ango wehî, aqil û kiryarên Pêxember hz Muhemmed in. Divê misilmanên rast li gorî van pîvanan xwediyê liv û tevgerê bin. Lewre ol ne çîrokên xeyalî, ne jî daxawziyên desthilatdaran e. Li gorî pîvanên olê destnîşan kirine, divê pirsgirêkên bawermendên Islamê werin destgirtin û çareserkirin. Pirsa xweparastin û berxwedanê ji bo mafê mirovan, wek parastina jiyana mirovî, ya saman, ya berdewamkirina neslê, ya aqil û baweriyê, wek tişta herî pîroz di her ola semawî de hatiye destnîşankirin.

Ji van pênc tiştan re tê gotin, pêncên pîroz. Êrîşa ser canê mirovan yan kuştin, wek mezentirîn guneh di Tewrat, Incîl û Qur'anê de hatiye bicîkirin.

Di Qur'ana pîroz de beramberî kuştinê qisas hatiye bicîkirin. 'Gelî bawermendan ji bo kuştinê qisas li ser we hate nivîsîn'.
(Beqere 178)

'Di Tewratê de me li ser wan ev nivîsî: Li hemberî can can, li hemberî çav çav, li hemberî bêvilê bêvil, li hemberî gu guh, li hemberî didan diran tê qisaskirin. Ji birîndarkirinêre jî qîsas heye'.
(Maîde 45)

Parastina van pênc tiştên me li jorê pênase kirîn, di jiyana dinya û axretê de wek zarurîyet tê dîtin. Dema ev pênc tişt di civakekê de pêk neyên di civakê de rizîn û belavbûn dest pê dike. Ola Islamê di civakeke misilman de parastina van tiştan zaruriyet pênase kiriye. Tu nikarî li ser navê olekê yan jî tiştekî ziyanê bigihînî van pênc pîroziyan.

Tu nikarî dest daynî ser samanê kesekî yan jî bidizî.

Hevalekî Pêxember SXL vê pirsê jê dike: Ya Pêxemberê Xwedê eger yek bixwaze malê min ji min bistîne, ez çi bikim?
- Malê xwe nede.
-Eger êrişî min bike?
-Tu jî êrişî wî bike.
-Eger min bikuje?
-Tu şehîd î.
-Eger ez wî bikuji?
-Ew diçe dojehê.

Parastina aqil, ji ber wê madeyên hişbir, alkol hatine heramkirin. Bi lîstina aqul yan xapandin gunehên mezin di Qur'anê de hatine pênasekirin. Çawa tiştên hişbir hatine heramkirin, xapandina mirovan û civakê jî gunehekî mezin hatiye cîbicîkirin.

Pêxember SXL: Kî me bixapîne ew ne ji me ye.

Ti kes nikare di meseleya olê de jî zorê li kesekî din bike. Ol meseleyeke hilbijartinê ye. Pêxember sirf teblîxê dikin, mafê ti kesekî nîne ola xwe bi ser kesekî de bisepîne, bi zorê dewetê olê yan jî hişmendiya xwe bike. Di vê derbarê de jî bi dehan ayetên Qur'anê hene. Derbarê parastina neslê de jî gelek ayet hene.

Sed heyf û mixabin, ola Islamê jî hatiye berûvajîkirin. Îro ev tiştên ku parastina wan pîroz e, herî zede di cihana Islamî de tên binpêkirin. Kuştin, destdanîna ser saman, lîstina bi aqil, tinekirina nesebê û bi zorê sepandina olê.

Îro tiştên pîroz yên Kurdan tev tên tinekirin. Li ser Kurdan tevan ferz e parastina van tiştên xwe yên pîroz bikin. Canê me, malê me, aqilê me, neseba me û ola me di binê êrişê de ne. Parastina wan li benda me ye.

## Şerê gel yê şoreşgerî: Bi sedan kobanî perwerdeya destwerdana lezgîn dibînin

**Di çarçoveya rewşa awarte de ku Rêveberiya Xweser ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê li hemberî êrişên dewleta Tirkan ya dagîrker ragihandiye, bi sedan şêniyên kantona Kobanê beşdarî perwerdeya destwerdana lezgîn bûne.**

Di çarçoveya rewşa awarte ya ku Meclisa Giştî ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê li hemberî gef û êrişên dewleta Tirk a dagirker ên li ser herêmê ragihandiye de, saziyên tenduristiyê di nava tiv û tevgerê de ne. Li herêma Firatê Heyva Sora a Kurd û nexweşxaneyên taybet dewreyên perwerdeyê yên destwerdana lezgîn ji şênî, endamên saziyên sivîl û leşkerî yên herêmê re vekirine. Armanca van perwerdeyan ew e ku hejmareke zêdetir ji şêniyan li ser destwerdana lezgîn perwerde bikin. Heyva Sor a Kurd a herêma Firat gelek navend vekirin û tê de waneyên li ser destwerdana lezgîn didin.

Heyva Sor a Kurd beriya çend rojan perwerdeyeke ji endamên Meclisa Malbatên Şehîdan, şêniyên herêma Firat û endamên Hêzên Ewlekariya Hundirîn a navçeya Sirînê re vekir. Di heman demê de li nexweşxaneya Emel a bajarê Kobanê û Heyat a Sirînê, dewreyên perwerdeyê yên destwerdana lezgîn berdewam in. Perwerde ji qonaxa teorîk derbasî qonaxa piratîkî bûye. Tê payîn ku wê hefteyekê dewam bike û bi zêdebûna elaqeya şêniyan bi wan perwerdeyan re, dewreyên din werin vekirin.
Çavdêrê beşa Destwerdana Lezgîn a Heyva Sor a Kurd a herêma Firat Ebdî El-Elî diyar kir ku armanc ji van perwerdeyan ew e ku bersiva rewşa awerte ya ku Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriye ragihandiye, were bicihanîn û şêniyan fêr bikin ku di dema êriş û rewşên awarte de çawa jiyana welatiyan xilas bikin. Têkildarî waneyên ku têne dayîn, El-Elî wiha domand: "Perwerdeyên me tenê di çarçoveya rawestandina xwîna birîndaran, mijûlbûna bi kesên ku ji hişê xwe biçin û rewşên şikenandin re sînordar e."

Endamê rêveber ê Akademiya Şehîd Emgîhan Cûdî ya Herêma Firat Silêman Silêman perwerdeya



destwerdana lezgîn weke gaveke girîng bi nav kir û got: ''Bi vê yekê em dikarin destwerdana lezgîn bikin eger hat xwestin. Em gelekî kêfxweş in ku em fêrî karekî bûn ku ji bo me nû bû."

Silêman bang li şêniyan kir ku bi aweyekî mezintir tev li perwerdeyên destwerdana lezgîn bibin ji ber ku ji bo wan û jiyana wan hatiye vekirin.
***ANHA***



# Alên dewleta dagîrker şewitandin û lihevhatina bi Şamê re red kirin

Li seranserê herêmên Sûriyê yên di binê dagîrkeriya dewleta Tirkan ya faşîst de, xwepêşandan li dijî siyaseta tirkî ya qirêj pêk hatin. Xwepêşandêran alên dewleta Tirkan şewitandin û lihevhatina bi hikumeta Şamê re red kirin.

**Navenda nûçeyan**

11'ê Tebaxa 2022'an, wezîrê karên derve yê dewleta tirkî ya dagîrker Mewlut Çawuş Oglu daxuyaniyek da û di daxuyaniyê de got, divê em opozisyon û rejîmê li hev bînin. Li dijî vê daxuyaniyê, bi dirûşma "Hilweşe Tirkiye û hilweşe rejîm" li gelek herêmên ji hêla dewleta tirkî ve hatine dagîrkirin wekî Ezaz, Cerablus, Marê, Rayî, Bab, Soran, Efrîn, Serêkaniyê, gundewarên Girê Spî û Idlibê, xwepêşdanên girseyî pêk hatin.

Çalakvanên medyayê jî bi rêya malperên medyaya civakî banga lidarxistina xwepêşandanan roja înê kirin da ku helwesta nû ya dewleta tirkî şermezar bikin û lihevanînê red bikin.

Li gorî Navenda Çavdêriya Mafên Mirovan a Sûriyê (SOHR), li Ezazê ya bakurê Helebê xwepêşandêr ketin avahiya Gerînendetiya Ewlehiyê ya li bajêr û berê xwe da avahiya "Meclisa Herêmî", her wiha ala Tirkiyê daxistin û şewitandin. Li kêleka wê jî xwepêşandêran bang kir ku tevahî alên dewleta tirkî yên li herêmên di bin serweriya çeteyan de werin daxistin.
Xwepêşandêran nehişt karwanekî dewleta tirkî di ser rêya Efrîn-Ezazê re derbas bibe.

Li ser dîwaran jî nivîsên mîna "Hilweşe Tirkiye û hilweşe rejîm" hatin nivîsandin. Helwesta xwepêşandana diyar dike ku serwextî dewleta tirkî bûyîne ku ew li gor berjewendiyên xwe bi kar anînin û niha jî disa li gor berjewendiyên siyaseta xwe ya qirêj dixwaze wan radestî rejîma Şamê bike. Ji bo wê li dijî vê sîyaseta tirkî ya qirêj her ku diçe xwepêşandan mazin û belav dibin; dewleta tirkî red dikin û ala wê di daxin û di şewîtînin.
Hêjayî bîraninê ye ku Mevlut Çawuşoglu di daxuyaniya xwe de eşkere kiribû ku di civîneke Cotmeha par de li paytexta Sirbistanê Belgradê hevdîtineke bi wezîrê karên derve yê hikumeta Şamê Feysel Mîqdad re kiriye.
Herwiha Çavişoglu da zanin ku Pûtîn ji zû de ji dewleta Tirk re pêşniyara ku têkiliyê bi Beşar Esed re deyne kiribû û gotibû: "Pûtîn û



rayedarên Rûsyayê ji zû de ji me re got ka em we û rejîmê bigihînin hev. Helbet tensîqekê istikbareta her du aliyan ve jî hebû."

## TEV-DEM: Pêngava 15'ê Tebaxê destana avakirina jiyaneke azad e

**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**

**TEV-DEM'ê salvegera 38'an ya Pêngava 15'ê Tebaxê pîroz kir û diyar kir ku 15'ê Tebaxê pêngaveke nîştimanî, wêrek û leheng bû. Herwiha da xuyakirin ku ev pêngave, li dijî qirkirin û mirinê destana avakirina jiyana azad e.**

Bi boneya salvegera 38'an ya Pêngava 15'ê Tebaxê, Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM) daxuyaniyeke nivîskî weşand.
TEV-DEM`ê di daxuyaniyê de salvegera 38'an ya Pêngava 15'ê Tebaxê li rêber Abdullah Ocalan, gelê Kurd, tevayî gelên azadîxwaz û demokrasîxwaz, hemû şoreşgerên azadiyê, girtiyan, tevahî malbatên şehîdan û welatparêzan pîroz kir û wiha got: "Pêngava 15'ê Tebaxê bi hemû aliyên wên felsefîk destaneke dîrokî ye, destana berxwedana şoreşgerî ya hemdemî ya nîştimanî ye, destana avakirina jiyaneke azad ji qirkirinê û mirinê ye, ya geşkirina rihê çanda fikirî, civakî û ekolojîk e ya ku li ser esas û nirxên civakî hatiye avakirin."

**'Pêngava 15' Tebaxê erşa faşîzma Tirk roxand'**

TEV-DEM`ê diyar kir ku Pêngava 15'ê Tebaxê pêngaveke nîştimanî bû û wiha got: "Pêngava 15'ê Tebaxê pêngaveke wêrek û leheng bû. Kesên bi xwe nebawer û bi gel, xak, nirxên exalqî û wefedariya bi wesiyeta şehîdn Berxwedana Tîrmehê yên di girtîgeha Amedê de û berxwedana gelê Kurd ne bawer bin, nikarin vê pêngavê bavêjin. Destpêkê, ev pêngav erşa faşîzma Tirk û dîktatoriya wê ya leşkerî ya binkeftî ya tirsok anî xwarê. Ev dîkatoriya ku veguherî rêxistineke terorîst hewl dide bi rêya torên terorîst û çetîtiya cîhanî hebûna xwe ya leşkerî û siyasî ya binkeftî ya hilweşiyayî vegerîne û ji dîtina çareseriyên aştiyane û demokratîk bê çare maye, ji ber ku xwe dispêre alava şer da ku hemû galan, di nav de gelê Tirk tune bike.

**'Pêngava 15'ê Tebaxê ya şoreşgerî di wijdanê her kesî de zindiye'**

TEV-DEM`ê da zanîn ku çirûska Pêngava 15'ê Tebaxê ya şoreşgerî di wijdanê me de zindî û wiha got: "Pêngava 15'ê Tebaxê bi rihê berxwedana Dihê û Şemzînanê heta berxwedana Rojava, Şengal, Herêmên Parasatinê yên Medya û gelemperiya Kurdistanê didome. Pêngava 15'ê Tebaxê ji 38 salan ve, ji berxwedana Hêzên Rizgariya Kurdistanê heta berxwedana HPG û YJA-Star û hemû komên parastinê berdewam dike. Em Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM), dibînin ku destana berxwedanê ya Pêngava 15'ê Tebaxê maska rast a



dewleta tirkî ya dagîrker anî xwarê ku bûye aliyekî sereke di Şerê Cîhanê yê Sêyemîn de û bi rêbazên siyaseta qirkirin, dagirkerî, guhertina demografîk, hedefgirtina sembolên me bi balafirên bêmirov ên biçek di nava 24 saetan de bê terdud, şer dike. Dewleta tirkî ya faşîst li dijî sîstema demokratîk a bi nûnertiya îradeya gelan şer ragihandiye da ku nîjadperestiya xwe û faşîzma xwe ya tundraw biparêze."

**'Divê gelên herêmê bi hevgirtina xwe nirxên dîrokî yên Pêngava 15'ê Tebaxê biparêzin'**

TEV-DEM`ê banga hevgirtinê kir û daxuyanî wiah qedand: "Em bang li hemû gelên ku ji bo azadî, edaleta civakî tê dikoşin û hemû rxistinên civaka sivîl û hêzên siyasî û niştimanî, tevahî gelên me yê Kurdistanê û tevahî pêkhateyên bakur û rojhilatê Sûriyê dikin ku hevgirtî bin, destkeftî û nirxên dîrokî yên Pêngava 15'ê Tebaxê biparêzin. 15'ê Tebaxê rihê vejîneke nû da gelên me, her wiha rêya avakirina şoreşeke civakî, nûjen û afîrn2er a bi pêşengtiya jin û ciwanan û tevahî beşên civakê nîşanî gel da."

## Sûcên hefteyekê li Efrîna dagîrkirî: Revandin, destdirêjî, birîna daran û talan

**Leşkerên artêşa tirkî ya dagirker û çeteyên wê di hefteya borî de 11 welatî ji gund û navçeyên kantona Efrîna dagîrkirî revandin, gelek dar birîn û mal û milkê welatiyan talan kirin.**

Dewleta tirkî ya dagîrker û çeteyên wê sûc û binpêkirinên li dijî şêniyên resen yên li kantona Efrînê ya dagîrkirî mane didomînin, da ku wan bidin koçberkirin.
Çavkaniyên ji hundirê kantona Efrînê da zanîn ku artêşa tirkî ya dagîrker û çeteyên wê di hefteyekê de 11 welatî revandin.
Li gorî çavkaniyan, kesên ji navçeya Cindirêsê yên hatine revandin ev in; Derwîş Hesen Mihemed (31) ji gundê Nesriyê ye, Ebdumecîd Hisên Mihemed, Wehîd Ebdo Ebdo (26) ji gundê Nesriyê ye, Mihemed Newres Îsmaîl (32) ji gundê Nesriyê ye û Şêxmûs Xelîl ji gundê Kefir Sefrê ye.
Ji navçeya Şiyê jî artêşa tirkî ya dagirker û çeteyên wê 3 welatî revandin; Elî Zuhêr Hemo (24) ji Şiyê, Mehmûd Keleş, Hesen Sebrî ji gundê Hêkêçê ye.
Ji navçeya Şêrawayê jî, dagîrkeran Xelîl Îsmaîl Elî (22) û Ehmed Nebo Ehmed ên ji gundê Burc Heyderê revandin.
Artêşa tirkî û çeteyên wê li navçeya Şera jî, Ehmed Yûsif Tobal ji gundê Meiriskê revand.
Li aliyekî din jî çeteyên "Feyleq El-Şam" li welatiyê bi navê Reşîd Ebdurehman Seydo yê ji gundê Meydankê yê navçeya Şera dema xwest milkên xwe vegerîne, da.
Li navçeya Mabeta jî, serçeteyê "Mihemed Fetih" 300 darên zeytûnê yên Mihemed Îbrahîm ê ji gundê Mist Eşûra, birîn.
Her wiha çeteyên "Muetesim Bîllah" ên artêşa Tirk a dagirker bi ser mala Mihemed Şêx Îsa yê ji navçeya Şera de girt û nêzî 10 hezar dolar û gelek telefon dizîn.



Li gundê Kefer Delê yê navçeya Cindirêsê, çeteyên "Firqet Hemzat" gelek tabloyên enerjiya tavê tevî alavên wê dizîn.
Li gundê Şadiya yê navçeya Raco jî, çeteyên "Ehrar Şerqiye" nêzî hezar û 500 darên henarê yên ayîdî Hisên Ehmed Xelîl Cafer ê ji gundê Mamila qut kirin.
Her wiha çeteyên "Firqet Hemzat" bi ser mala Hebîb Berho (80) yê ji gundê Maratê yê girêdayî navenda Efrînê de, girt.
Çeteyên "Sultan Murad" nêzî 80 darên zeytûnê yên Henan Ebdurehman yê ji gundê Qurtqulaqê yê navçeya Şera birîn.
***ANHA***

# ’Di jiyanê de azadî, di şer de serkeftin’

Mihemed Emîn Elîko diyar kir ku çalakiya QSD’ê ya dawî ya li dijî dagîrkeriya tirkî xeteke nû ya berxwedanê ye û got, ji bo têkbirina êrişên dagîrkeriyê, heta asteke bilind gel amade ye.

**Mihemed Xanim /Şehba**

Dewleta tirkî ya dagîrker roj bi roj êrîşên bi balafirên bêmirov yên ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê zêde dike. Di van êrîşan de gelek kesên giranbiha şehîd dibin. Ji destpêka meha Tebaxê ve 2 jê zarok, 7 welatî şehîd bûn, 10 zarok û 3 jin, bi giştî 17 welatî jî birîndar bûn. Li hemberî van êrişên dagîrkeriyê QSD`ê rêzeçalkiyên tolhidanê li dar xistin.

Derbarê zêdebûna êrişên dagîrkeriya tirkî, bersiva QSD’ê û amadekariya gel ya li dijî êrişan, Endamê Meclisa Giştî ya Partiya Yekîtiya Demokratik (PYD) şaxê Efrînê, Mihemed Emîn Elîko ji me re axivî.

### ’Sedema zêdebûna êrişên ser Rojava binketina li herêmên Medya ye’

Mihemed diyar kir ku êrişên dewleta tirkî ya dagîker yên ser herêmê ne nû ne û wiha got: “Bi dehê salan e ku dagîrkeriya tirkî êrişî Kurdistanê dike. Lê di çend salên dawî de êrişên xwe zêde kirine. Ji Til Rifet heta Til Temir her roj herêm tê toprankirin. Dagîrkerî bi şewazên cuda êrişî gelên herêmê dike. Carna leşkerî, carna bi şerê tayebet û sîxuran dixwaze armanca xwe pêk bîne. Herî dawî bi balafirên bêmirov yên biçek kesayetên pêşeng û welatiyan dike amanc. Me dît bê çawa li taxa Sînaa ya bajarê Qamişlo, zarok kirin amanc û şehîd xistin. Ji ber ku li Herêmên Parastinê yên Medya derbên giran dixwe û êdî nikare êriş bike, bi awayekî hovane êrişî bakur û rojhilatê Sûriyê dike. Li Tirkiyê asta faşîzmê pir bilind bûye. Erdogan dixwaze faşîzma xurttir bike û ji bo hilbijartinên 2023’yan bi kar bîne. Herwiha dixwaze çeteyên DAIŞ’ê careke din li herêmê bihêz bike. Ji bo meşandina siyaseta xwew tevayiya rêbazên dijexlaqî bi kar tîne.”

### ’QSD’ê tol hilda û rûmeta gelê herêmê parast ’

Mihemed bal kişand ser çalakiyên QSD’ê yên li dijî dagîrkeriya tirkî û wiha got: “Çalakiyên QSD’ê yên li dijî dagîrkeriya tirkî, mafê herî rewa yê li hemberî êrişan e. **Dema dawî hovîtiya Tirkiyê gihiştiye asta herî bilind. QSD’ê ne hêzeke bêçare ye ku xwe bêdeng bike**. Lewra îradeya gelên herêmê ye. Gelên bakur û rojhilatê Sûriyê tev QSD’ê himbêz dikin û piştgiriya wê dikin. Çalakiya QSD’ê ya dawî ya li hemberî dagîrkeriya tirkî, bersiva gel ya êrişên dagîrkeriyê ye, lewra parazvana gel e. Fermandarên QSD’ê soza hilanîna tola şehîdan bi cih anîn û bêdeng neman. Em gelên bakur û rojhilatê Sûriyê heta dawî piştgiriya QSD’ê dikin û çi bê xwestin emê bikin. Lewra rûmeta gelên herêmê parast û di ber tevayiya cîhanê de şerê terorê kir. Em bersivdaya wê ya dagîrkeriyê pîroz dikin û ev bersiv cihê serbilindayiyê ye. Bi ruhê Şerê Gel yê Şoreşgerî






emê dagîrkeriyê bin bixin û Sûriyekê azad ava bikin.”

### Tirkiye ji bo bazara li ser kurdan çeteyên xwe difiroşe rejîma Sûrî

Mihemed da xuyakirin ku li dijî îradeya gelên herêmê, di navbera Rûsya, Îran û Tirkiyê de peymanên veşartî yên qirêj tên morkirin û wiha dirêjî da axaftina xwe: “Krîza Sûriyê her ku diçe kûrtir dibe. Astana û Soçî sedemên serke yên kûrbûna vê kirîzê ne. Dewletên wekî Rûsya , Îran û Tirkiyê ji bo berjewendiyên xwe li ser Sûriyê bazarê dikin. Li gorî daxuyaniyên Tirkiyê yên derbarê lihevhatina bi hikumeta Şamê re, tê xuyakirin ku di navbera Rûsya , Tirkiyê û rêjima Esed de peymanên nû pêk hatine. Wezîrê karê derve yê Tirkiyê Mewlûd Çawîşoxlu eşkere got, em amade ne destekê bidin rêjima Esed. Armanca dagîrkeriya tirkî têkbirina Rêveberiya Xweser û qirkirina gelên herêmê ye. Rûsya jî ji bo berjewendiyên xwe dixwaze di navbera hikumeta Şamê Tirkiyê de peymana Adana`ya 2’yan çêke. Lê çiqas êriş û peymanên qirêj çêbin, gelên bakur û rojhilatê Sûriyê ti caran gavan paş ve navêjin. Sûriye êdî nikare vegere wekî berî 2011’an. Divê hikumeta Şamê û alîgirên wê vê baş bizanin. Projeya Neteweya Demokratîk li pêşiya planên dagîrkeriyê bûye kelem, ji ber wê bi tevayiya hêza xwe êrişî wê dike. Erdogan kesayeteke faşîst e û ji bo seranserê cîhanê xeter e.”

### ’Gelê herêmê ji bo şerkî dijwar û demdirêj ama de ye’

Endamê Meclisa Giştî ya Partiya Ykîtiya Demokratîk (PYD) şaxê Efrînê, Mihemed Emîn Elîko da zanîn ku piştî ragihandina rewşa awarte ji aliyê Rêveberiya Xweser ve, gelên herêmê bi giştî di perwerdeyên leşkerî û fikrî re derbas dibin û axaftina xwe wiha qedand: “Divê gelên herêmê pişta xwe bi ti hêzên biyanî germ nekin û li hêza xwe xwedî derkevin. Ti hêzên derve wê gel neparêzin. Xwedîderketina li xwîna şehîdan û parastina destkeftiyên şoreşa Rojava erkê her kesî ye. Gelê bakur û rojhilatê Sûriyê li her derê helwesta xwe nîşan da û piştgiriya hêzên xwe yên leşkerî ragihand. Ti kes nikare îradeya gelên herêmê bişkîne û roja me tarî bike. Lewra gelê bi fikrê azad yê Rêber Apo perwerde bûyî êdî ji bilî azadiyê tiştekî qebûl nake. Dem ne dema berê ye, ti kes nikare li ser gelê me lîstikan çêke. Doza Kurdan bûye çareseriya pirsgirêkên Rojhilata Navî. Armanca tecrîda li ser Rêber Apo, êrişên ser Herêmên Medya û bakur û rojhilatê Sûriyê qirkirina gelên azadîxwez e. Lê wê bi ser nekevin.”

Ji bo tolhildana şehîdan 8’ê vê mehê li ser sînorê bajarê Mêrdînê, QSD’ê 3 çalakiyên bibandor kirin. Di van çalakiyan de yek jê panzer, sê wesaitên zirxî hatin roxandin, 23 leşker hatin kuştin, herî kêm 2 leşker jî birîndar bûn.
QSD`ê herwiha soz da ku wê ti êrîş bêbersiv nemînin.

## Gerîlayên Kurdistanê



**Farûk SAKIK**

Di dawiya salên 70’yî de PKK li Lubnanê bû. Li kêleka rêxistinên Filistinî li dijî Îsraîlê şer dikir. Armaceke vî şerî jî tecrûbebegirtina taktîkên gerîlatiyê bû. Di dawiya payîza sala 1979’an û di destpêka zivistana sala 1980’yî de, hin kadro û rêveberên tevgera PKK’ê ku di nava wan de Kemal Pir, Mehmet Sevgat, Delil Dogan, Suphî Çevîrcî, Seyfettîn Zugurlu û Mahsum Korkmaz jî hebûn, derbasî Lubnanê bûbûn. Demeke dirêj perwerdeya gerîlatiyê dîtin û piştî demekê biryara vegera welat dan. Berî ku komên gerîla werin, Rêber Apo hin herêm ji bo şerê gerîlatiyê tesbît kiribûn; Semsûr, Dêrsim û Xerzan. Kom wê derbasî van herêman bûbûna, ji bo şerê gerîlatiyê amadekariyan bikin û piştî demekê jî wê dest bi şer bikirana. Rêber Apo hin kes erkdar kiribûn. Delîl Dogan wek berpirsê Dêrsim, Egîd yê Xerzan û Îrfan Palabiyik û Mehmet Sevgat jî yên herêma Semsûrê hatibûn destnîşankirin. Ji bo herêman tevan komîteyek hatibû amadekirin. Kemal Pîr jî berpirsê koman tevan bû. Rêveberî radestî wî kiribûn. Wê wî koordîne bikira. Koma Masûm Korkmaz û Kemal Pir tê de, li ser riya Batman-Kozlukê ji aliyê dijmin ve tên sekinandin. Kemal Pîr û hin kesên din hatin girtin û Mahsûm Korkmaz jî bi tesadufî xilas dibe. Her kes li bendê bû ku bi Kemal Pîr şerê gerîlatiyê dest pê bike. Lê belgeyên li ser Kemal Pîr hatin girtin. Dijmin pê hesiya ka amadekariyeke çawa hatiye kirin. Wê rojê gelek xeyal şkestin. Piştî hingê darbeya 12’ê Îlonê çêbû. PKK li derveyî welat li Lubnanê di warê eskerî de perwerde dibû. Amadekariya şerê gerîlatiyê dikir. Ezmûnên ji kampên Filîstiyan girtibûn wê derbasî Kurdistanê bikirana. Di Tîrmeha 1984’an de 6 pêşengên PKK’ê, li herêma Lolanê di civînek de bûn. Di vê civînê de biryara avakirina HRK- Hêzên Rizgariya Kurdistanê hat dayîn. Herwisa biryara pengava 15’ê Tebaxê jî li wir hat dayîn. Piştî vê civînê û van biryaran dawiya Tîrmehê, li Şkefta Brîndaran civîneke berfireh hat lidarxistin. Kesên wê tevlî çalakiyê bibin hatin diyarkirin. Plana çalakiyê hat amadekirin. Herî dawî li ser 3 navçeyan biryar hat dayîn. Dihê, Şemzîna û Şax. Li wir biryara damezirandina rêxistina leşkerî-HRK û çalakiyê dabûn lê di vê civîna duduyan de jî biryar dan ka bi çi rengî û kengê çalakî bên ragihandin. Ji çalakiya Dihê (Erûh) re Egîd (Mahsûm Kormaz) wê fermandarî bikira. Ew jî li Bakûr bû û ji bo bicihkirina hêzên HRKê dixebitî. Dema jê re biryara çalakiyê hat, ew li herêma Çaraxan bû. Dema Egîd biryara çalakiyê girt, dest bi amadekariyan kir. Egîd piştî ku yekîneyên 15’ê Tebaxê kom kirin, bi xwendina belavokê, HRK ragihand. 15’ê Tebaxa 1984’an bi fîşeka yekê ji bo azadiya Kurdistanê pêşgava gerîlatiyê da destpêkirin. 25’ê Cotmeh 1986’an li Lubnanê di Kongreya 3. ya PKK’ê de, dawî li HRK-Hêzên Rizgariya Kurdistanê hat. Êdî hatibûn asteke wisa ku pêdivî bi artêşekê dîtin. Di heman kongreyê de, biryara avakirina “Artêşa Rizgariya Gelê Kurdistanê – ARGK dan. Di sala 2000’î de, di kongreya 7. de artêşê nav guhert. Êdî gerîla naveke din girt: Hêzên Parastina Gel-HPG. Belê… sala 1979’an gerîlatiya ku Kemal Pîr û hevalên xwe wê li Kurdistanê belav bikirana îro di binê sîwana HPG û YJA Starê de Kurdistan tê parastin. Ala gerîlatiya Kurdistanê ya di destê Kemal Pîr û hevalên wî de bû, îro Mûrat Karayilan û hevalên xwe dewr girtine.



# Ehmed Gulo: Emê tola şehîdan hilînin û armanca wan pêk bînin

Ehmed Gulo da zanîn ku êriş û balafirên dagîrkeriya Tirkan ti caran nikarin vîn û berxwedana wan bişkînin. Herwiha got, pêwîstiya azadiyê bi çi hebe emê pêk bînin û bigihîjin armanca şêhîdên xwe.

**Darîn Silê/Qamişlo**

Êrişên dewleta Tirkan ya dagîrker li dijî herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê didomin. Bi taybetî di vê dema dawî de êrişên xwe zêde kirine û êrişî tax û erebeyên welatiyan yên nava bajêr dike. 9`ê vê heyvê jî bi balafirên xwe yên bêmirov êrişî navendeke Hêzên Erka Xweparastinê ya li bajarê Qamişlo kir. Di encamê de 4 şervanên Erka Xweparastinê şehîd bûn. Yek ji wan Mihyedên Qehreman Gulo bû, ku di nava malbata Gulo de bû şehîdê 15`an.

Derbarê şehîdbûna Mihyedîn Gulo û êrişên dewleta Tirkan ya dagîrker yên li dijî herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê, herwiha zêdekirina bikaranîna balafirên bêmirov û zêdebûna xayîn û sîxurên dewleta tirkî ya dagîrker, Apê şehîd Mihyedîn Ehmed Gulo ji me re axivî.

### `Mirateya têkoşîna azadiyê di malbatê de bê navber hat domandin`

Ehmed Gulo da zanîn ku malbata wan ji berê ve kar û xebata tevgera azadiyê dike, herwiha li ser fikir û felsefeya Neteweya Demokratîk ya rêbertiyê danî, tev digerin û axaftina xwe wiha domand: “Piştî ku me fikir û felsefeya Rêber Apo nas kir, em tevlî têkoşîna azadiyê bûn. Çimkî me dît ku ev fikir û felsefe ne ji bo bidestxistina mafê gelê Kurd tenê, ji bo mafê tevayiya gelan e. Herwiha diyar bû ku ev fikir wê bibe bersiva tevayiya gelê Rojhilata Navî. Ji bo wê jî di sala 1984`an de dema ku hêzên leşkerî ava bûn, zarokên me jî tevlî vê hêzê bûn. Şehîdê malbatê yê yekê jî Nûredîn Gulo bû. Piştî şehadeta Nûredîn Gulo gelek zarokên me li dû şopa wî tevlî tevgera azadiyê bûn û mirateya têkoşîna azadiyê di malbatê de bê navber hat domandin. Ji wê demê ve em li ser vê xetê û bi fikrê rêberê xwe, xebata xwe didomînin û Şehîd Mihyedîn bû şehîdê 15’an yê malbatê.”

### `Bi her şehîdî re em soza xwe nû dikin`

Ehmed Gulo got, ji bo ku em azadiyê bi dest bixin me 15 şehîd dan, hê jî emê bidin û ev yek li gotinên xwe zêde kir: “Ji ber ku em welatê xwe diparêzin û doza azadiyê dikin, dijmin her tim me dike hedef. Çimkî naxwaze welatparêz û pêşengên gelê Kurd hebin. Lê pêwîstiya azadiyê bi çi hebe emê pêk bînin. Divê em bizanin ku azadî bi gotinan nayê, qelenê azadiyê dayîna berdêlan e. Ji bo wê jî heta ku em azadiyê bi dest bixin emê gelek berdêlên din jî bidin. Çimkî bi her şehîdî re em soza xwe nû dikin û gavekê ber bi azadiyê ve diavêjin. Me gelek şehîd berî Mihyedên dane û emê hê jî bidin. Em tola şehîdên xwe li erdê nahêlin, emê tola wan hilînin û armanca wan pêk bînin.”




### `Divê her kes erkê welatparêziyê pêk bîne`

Ehmed Gulo destnîşan kir ku dewleta Tirkan ya dagîrker di nava xwe de pir teng bûye, ji bo wê jî rojane êrişî herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê dike û wiha dirêjî da axaftina xwe: “Dagîrkeriya Tirkan bi tevayiya cureyên hovîtî û wehşiyetê êrişî seranserê herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê dike. Herwiha kesên welatparêz û pêşengên Kurdan dike hedef. Erdogan bi zêdekirina êrişan, ji me re dide xuyakirin ku dawiya wî hatiye û ketiye qonaxeke pir teng. Ji bo wê jî divê em vê derfetê ji destê xwe winda nekin û em Tirkiyê tengtir bikin. Divê her kes erka xwe ya welatparêzî pêk bîne. Em bang li birayên xwe yên Ereb, Faris, Ermen û Suryan dikin ku li dijî dewleta dagîrker xwedî helwesteke xurt bin. Da ku em bi hev re, hevgirtina xwe ava bikin û li dijî dagîrkeriyê azadiya xwe bi dest bixin. Ji bo wê jî eger em îro hevgirtî bin emê teqez azadiya xwe pêk bînin û wê serkeftin para me be.”

### ‘Zerara herî mezin sîxur û xayîn didin şoreşê’

Ehmed Gulo derheqê xayîn û sîxûran de jî wiha got: “Di cîhanê de dema ku şoreş nêzî serkeftinê dibin, dijmin sîxurên xwe li dijî wê şoreşê didin bikaranîn. Ev ajan xwe dixin kirasê welatparêzan û di nava gel de dijîn. Dewleta tirkî ya dagîrker jî niha sîxurên xwe li tevayiya herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê belav kirine, da ku bi rêya van tevayiya bûyer û agahiyên herêmê nas bike. Ji bo wê em



bang li tevayiya gelê xwe yên bakur û rojhilatê Sûriyê dikin ku hay ji van kesan hebin û dema kesên wisa nas bikin, yekser agahiyê bidin rêveberî û saziyên pêwendîdar. Da ku em bi hev re dawî li van kesan bînin. Çimkî bi hezaran zarokên me li ser destê van kesan şehîd ketine. Heriwiha zerera me ya mezin li ser destê wan çêdibe. Îro Tirkiyê bi hezaran ajan bi ser me de şandine. Ji bo wê jî divê em di vî milî de balder bin, herwiha şopandina van kesan bikin û wan tine bikin.”

### `Tirkiye nikare dawiya Kurdan bîne`

Ehmed Gulo di dawiya axaftina xwe de got, Tirkiye bi çi awayî êrişî me bike nikar me tine bike, nikare dawiya Kurdan bîne. Êriş û balafirên dagîrkeriya tirkî nikarin vîn û berxwedana me bişkînin. Me biryar daye emê biryara xwe pêk bînin û bigihin azadiya xwe.




## FENER

## Lembeya kesk ji bo tinekirina Kurdan her pêketî ye



**Idrîs HENAN**

Îro têkoşîna gelê Kurd ya azadî û serxwebûnê, di hestiyartirîn qonaxa xwe ya serkeftinê de ye. Gelên azadîxwaz bi pêşengiya têkoşîna tevgera Kurdan ya azadî û demokrasiyê, ji her demê pirtir nêzî serkeftinê bûne. Di şexsê xebata hevpar ya gelan de, nirxtirîn destkeftiyên Neteweya Demokratîk bi dest dikevin û her çand li ser koka xwe şîn dibe. Ji ber vê tevgera gelan ya azadiyê û israra jiyana birûmet, dijminê mirovayiyê û Kurdan ketiye nava taya mirinê û êrişên xwe berfirehtir kirine. Hewl dide wan destketiyên gelan têk bibe û sîstema wan ya xwebirêvebirinê jî tine bike. Di encamê de, paralelî xeta êrişkar ya dagîrkeran, careke din xeta xiyanetê çalak bûye û 6’ê vê mehê, li taxa Sînaa ya bajarê Qamişlo bi şehîdbûna Endamê Meclisa Rêveberiya Partiya Jiyana Azad ya Kurdistanê (PJAK) Rêzan Cawîd (Yûsiv Rebanî) re, gihat lûtkeyê. Ango bi şehîdbûna Rêzan Cawîd û bi dehan zarokên Rojava û Bakur û Rojhilatê Sûriyê re diyar dibe ka xeta xiyanetê çiqas noqî çala celad û dagîrkeran bûye. Di heman wextê de, tiştên me ji bav û kalan dibihîstîn yan me di pirtûkan de xwendîn, pir bi zelalî diyar dibe ku tevî berbelavî û dijberiya berjewendiyên dagîrkeran, di qirkirina gelê me de heman fikir in. Em li gotina mezinên xwe ya “rih bibe bost, dijmin nabe dost” çend metroyan jî zêde bikin, dijminê bêesil qet nabe dost. Yê ji wî tirsnaktir jî, dijminê hundir yê bêkok û bê heysiyata neteweyî ye ku dikare ji bo çend qurûşan rûmeta xwe bifiroşe. Çawa berê, îro jî derbasdar e; serfermandarê têkoşîna azadiyê, gerîla û fermandarê gewre, Mahsûm Korkomaz (Egîd) digot; rêya yekane ya azadî û xilasiyê ya gelê me, li dijî faşîzmê, avakirina eniya berxwedanê ya hevpar û yekgirtî ye. Bi çalakiyên hevbeş yên hêzên şoreşger, demokrat, pêşverû û neteweyî, dikare eniya faşîzmê bê roxandin. Di wê eniya faşîzmê de dagîrkerên Kurdistanê tenê nînin, tevayiya xwefiroş, kurtêlxwar û xayînên hemdem yên bermayiyên hilberîna sîstema kedxwar ya faşîst û sermayedar jî tê de cih girtine. Piştî civînên aliyên Astana yên li Tehranê û civana dualî ya 5’ê Tebaxê ya di navbera Erdogan–Pûtîn ya li Soçî de, koordîneya xeta behsa mijarê bi dagîrkeran re zêdetir bûye. Heta em xwe nexin binê bandora gotinên xapînok yên weke “ha lembeya kesk pê ket, ha pê neket”, divê em xwediyên wê têgihiştinê bin ku ti carî ew lembeya kesk ji bo tinekirina Kurdan û têkbirina têkoşîna hevpar ya gelan venemiriye. Yên tiliya wan jî li ser pêleka wê lempeyê ye, xeta koodînator ya xiyanetkar e. Mixabin rastiyek e pêwîst e em jê nerevin û li hemberî wê, berî dijmin, bi şîreta Fermandar Egîd bikin ku gotinên wî heya roja me ya îro derbasdar û watedar in. Li gorî wê perspektîfa şoreşgerî ya Egîdan, îro Hêzên Sûriyeya Demokratîk (QSD) û Hêzên Rizgariya Efrîn (HRE), li benda ti lembeyan nasekinin û ji bo zindîhiştina perspektîfa şoreşgerî ya Egîdan, guhên Tirkiyê ba didin. Amade ne her plan û lehevkirinên veşartî bi oparasyonên şoreşgerî têk bibin, ku wê êrişên Tirkiyê ji nedîtî ve neyên û wê bersiva guncaw di her dem û cihî de bidin dagîrker û xiyanetkaran.